
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1260 30-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Cil û bergên kevnar wek belgeyeke di dîrokî de tên xwendin’

Navenda Nûçeyan

**Sanbel Şoceyî ya ku ji bajarê Urmiyê ye qala parastina cil û bergên Kurdî kir û wiha got: “Di cil û bergên Kurdî yên çandî de ezmûnên bi hezaran salan hene ku nifş bi nifş hatiye ragihandin.”**



Çanda her neteweyekê beşeke ji nasnameya wê netewê ye ku ji hev nayê veqetandin û mirov dikare gelek zanyariyan li ser hemû aliyên dîrokî yên wê netewê bi rêka çanda wê bi dest bixe. Cil û berg dikare yek ji hêmanên sereke yên çandê were hesibandin. Bikaranîna cil û berg, xemilandin û şêwaza wan dikare der barê nasnameya çandî, civakî û dîrokî ya komek mirovan de gelek agahiyan nîşan bide.
Cil û bergên Kurdî tevî guhertinên çandî û derketina şêwaz û şêweyên cil û bergên cuda yên ku li cîhanê serwer in, hîna jî ji aliyê gelê Kurd ve di jiyana xwe ya rojane de tê bikaranîn û li hevhatina vê cil û bergê ji bo demên cuda ji mijara estetîk wêdetir nîşana nerm bûyin û bikêrhatina wê ye. Cil û bergên jinên Kurd li herêmên cuda yên Kurdistanê û heta li gorî curê bikaranîna wan jî cuda dibe û di dirûtina wê de qûmaşên curbecur wek bergan, hevrîşim, qedîfe û hwd. bi şêweyên cuda tên bikaranîn.
Şêwekar Sanbel Şoceyî ya ji Urmiye ya Rojhilatê Kurdistanê derbarê cil û bergên kevnar ên Kurdî de axivî..
Sanbel Şoceyî, di destpêka axaftina xwe ev tişt got: “Ez li bajarê Urmiyê dijîm. Min li zanîngeha Şîrazê beşa şêwekarî û dirûtinê qedandiye û nêzî 17 sal in ez di vî warî de dixebitim.” Sanbeş Şoceyî, wiha got: “Daxwaza vê beşê li gorî berê zêdetir bûye û pir kes dixwazin di vê beşê de kar bikin. Her çend ev beş nêzî 60 sal in li welatên Ewrûpayê wekî pîşesazî tê hesibandin lê ev nêzî deh sal in li herêma me di bazar û warê hûner de wek qadeke pîşeyî hatiye qebûl kirin û min bi xwe jî di vî warî de gelek hewl da û pê re eleqeder bûm.”

### ‘Cil û bergên Kurdî weke muzexaneyekê ne’

Sanbel Şoceyî, der barê pêşwazî kirina gel ya cilên Kurdî de ev tişt dibêje: “Ger em bixwazin cil û bergên Kurdî di jiyana rojane de were bikaranîn, wek berê zindî bimîne û ji holê nerabe divê bi şêwazê nûjen were parastin û li gorî şert û mercên Estetîk û Sosyolojiya îroyîn were şêwe kirin. Cil û bergên Kurdî taybetmendiya vê erdnîgariyê ye û ji aliyê kesên ku li ser vê ernîgariyê dijîn ve hatiye dîzayn kirin û di dîrokê de cihê xwe kiriye. Pêvajoya çêkirina cilên Kurdî xwezayî ye û mirov dikare pêşdeçûna dîrokî û rewşên çandî, siyasî, olî û erdnîgariyê tê de bibîne. Cil û bergên Kurdî weke muzexaneyekê ne û weke belgeyek dîrokî tê xwendin.”

### ‘Divê em cilê Kurdî biparêzin û nehêlin tune bibe’

Sanbel Şoceyî, di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku di pêvajoya ku cil jî wek hertiştî ji xwezayî bûna xwe derketiye de parastina cil û bergên Kurdî gelek girînge û wiha got: “Di 30 salên dawî de jîngeha jiyanê guheriye û cil û berg jî hatine guhertin. Dema em li ser cil û bergên jinan di 300 an 400 salên dawî de lêkolîn dikin em digihijin wê encamê ku divê em wan neguherînin û divê wan li gorî şertên jiyana rojane ya xwe guncaw bikin. Bi şert û mercên giştî yên cîhanê re cil û berg jî hatiye guhertin. Îro cil û berg bûye yekreng û divê em cilê Kurdî biparêzin. Lewma bêyî guhertina giştî û bi guhertinên rast di hurguliyan de wan biparêzin. Cil û bergên Kurdî bi zanabûn hatiye dîzayn kirin û mirov dikare ezmûnên hezaran salan ku nifş bi nifş hatiye ragihandin, bibîne.”

### ‘Cil û bergên berê jî parçeyek ji dîrokê ne’

Sanbel Şoceyî, der barê nêzîkatiyê nifşên nû ya ji bo li xwe kirina cilê Kurdî de wiha dibêje: “Nifşên îro dema cilê dayîk an dapîra xwe li xwe dikin li gorî şertên îro hinek beşên wê diguherînin, lê resenîya wê cilê zîndî dimîne. Nifşên nû jî bi cil û bergên Kurdî re eleqedar in. Di van rojan de cil û bergên herêmî ji cil û bergên Kurdî yên resen tên wergirtin. Dibe ku di hin cil û bergan de parçeyên girîng ên cil û bergên Kurdî hatine rakirin û ev jî pêvajoyek ji dîroka cilê Kurdî ye. Her wiha dibe di salên pêş de ji nifşên nû li gorî şert û mercên heyî cilên Kurdî li xwe bikin. Divê em bizanin ku ew jî rûpelek dîrokê nîşan didin û cil û bergên berê jî parçeyek ji dîrokê ne.”

### ‘Kember ji bo parastina pişt û zikê jinan dihat bikaranîn’

Sanbel Şoceyî, der barê têkiliya di navbera şekil û reseniya cilên Kurdî de dibêje: “Ez dixwazin der barê kurahiya resenî û bi kok bûna cilên herêmî yên Kurdan de balê bikşînim li ser kemerê ku jin û mêrên Kurdan bi salane bikar tînin. Bikaranîna wan kemera pir zêdeye. Berê mêran ji bo kemerê pênc an şeş metrî wek xelek bikardanîn ku ji çiyayên asî derbas bin. Beşa herî girîng a vê kemberê parastina laş û stûyê û di jinan de ji bo parastina pişt û zikê wan tê bikaranîn.”



### ‘Min di mihricanê de cil û bergên Kurdî pêşkêş kir’

Sanbel Şoceyî, di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ez li Şîrazê tevlî mîhrîcana cil û bergên netewan bûm û cil û bergên Kurdî yê herêma Mako û Xoyê wek semînerek pêşkêş kir ku piştre wek pelên niviskî bigihije destê xwendevanan. Her wiha min di pêşangehek li Şîrazê de cil û bergên Kurdî da nasîn û pir kêfxweş bûm ku ji aliyê gelên din ve jî hate pêşwazî kirin. Di pêşerojê de jî ez ê tevlî mîhrîcanên cîhanî bibim.”

Sudoku: Bersiv 33

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 7 |
| 7 | 6 | 9 | 4 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 |
| 2 | 4 | 1 | 3 | 8 | 7 | 5 | 6 | 9 |
| 5 | 2 | 3 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 | 1 |
| 1 | 7 | 4 | 2 | 9 | 8 | 6 | 3 | 5 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 7 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 4 | 1 | 5 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 6 |

Sudoku:Pirs 34

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 5 | | 4 | |
| | | | | | 3 | 6 | 2 | 5 |
| 1 | | | | 6 | | | 8 | 3 |
| 6 | 4 | | | 3 | 1 | | 7 | |
| | | | | | | | | |
| | 3 | | 5 | 8 | | | 9 | 2 |
| 8 | 5 | | | 2 | | | | 1 |
| 4 | 1 | 7 | 3 | | | | | |
| | 2 | | 7 | | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER KAR Û XEBATÊ

**Berê xwe fireh kiriye:**
- Karê xwe giran kiriye; kar gelek daye pêşiya xwe.

**Dirêse lê nikare bide hemberî hev:**
- Dixebite lê encamê jê nagire.

**Em ber xwe nabînin:**
- Karê me pir tevlîhev e; karê me pir giran e.

**Emrê legê bi teqûreqê:**
- Dema me tev bi sergêjiyê derbas dibe.

**Her du lingên min xistin sola teng:**
- Karekî pir zehmet da pêşiya min; di demeke wisa teng de alîkarî ji min xwest ku nikaribim tiştekî bikim.

**Ji vî karî re qûneke mezin divê:**
Ev karekî pir zehmet e, ne karê her kesî ye.

**Kavirên wî belav in:**
- Sergêjiyên wî pir in; karê wî pir e.

**Ling kiriye soleke teng:**
- Karekî pir zehmet da pêşiya min; di demeke wisa teng de alîkarî ji min xwest ku nikaribim tiştekî bikim.

**Ne roj li min roj e ne şev li min şev e/ne roja min roj e ne şeva min şev e:**
- Dema karê yekî pir be, yan jî pir nexweş be hingê dibêje.

**Pê re nagihe serê xwe bixwerîne:**
- Zemanê wî nîne; karê wî pir e.

**Rizqê me di devê gur de ye:**
- Karê me pir giran, bixeter û zehmet e.

**Rizqê me di latê de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Siwarbûna kerê şermeke e peyabûn du şerm in:**
- Tiştekî yan bila mirov neke, yan dema morov kir divê heta serî bibe.

**Serketin şermek e daketin du şerm in:**
- Bi heman wateyê.

### LI SER GEFXWARINÊ

**Bila ez weke te bim:**
- Ez ji te re qebûl nakim; ez dizanim ka ezê çi bikim.

**Bila ez ji te xirabtir bim:**
- Bi heman wateyê.

**Bila ez kurê te bim:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Vîna gel ji êriş û komkujiyên dagirkeriya Tirk xurtir e’

Malbata şehîdên komkujiya gundê Berxbotanê yê Kobanê diyar kirin ku bi komkujiyan vîna wan nayê şikandin û gotin: “Em bi şehadeta zarokên xwe ser bilindin û tu carî vîna me li hember êriş û komkujiyên dagirkeriya Tirk lawaz nabe, berovajî wê vîna me xurtir dibe.”R-3




## ‘MED TV kaniya rastiyê bû’

Yek ji damezrêner û xebatkarên kanala yekem ya Kurdî MED TV Bedran Dere da xuyakirin ku avakirina MED TV bingeha dengê şoreşê bû û wiha got: “MED TV hewil da hemû erk û berpirsyarên xwe bicîh bîn e.”R-5



## ‘Huner peyama aşitî û hezkirinê ye’

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo destnîşan kir ku huner peyama aşitî û hezkirinê ye û wiha got: “Firçeyên me êş, derd, îrade û hêza gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi hêviya azadiyê ne hilgirtiye. Em bi hêvî ne ku tabloyên êşê veguhere xêzkirina rengên jiyanê û xweşikbûna di herêmê de.”R-7



## Kevneşopiya Satî

Rêber Apo di peyama xwe ya 8’ê Adarê a di çarçoveya banga Aşitî û Civaka Demokratîk de ku ji jinan re şandibû, balê dikşîne ser têkoşîna jinan a ji bo azadiyê. Herwiha Rêber Apo behsa çanda “Satî” jî dike.R-6



**Divê Şam xwe ji aqûbeta Baas biparêze**
Idrîs Henan R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1260 30-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# HÊVIYA GELAN SÛRIYEKE DEMOKRATÎK E

Bi rûxandina rêjîma Baas li Sûriyê, hêviyên gelên Sûriyê ji bo guhertina demokratîk geş bûn ku dawî li stemkarî, paşverûtî û desthilatdariya yek partî, yek mezheb û yek neteweyî bîne. Lê di kiryarên desthilata nû a Şamê de tê xuyakirin ku ew ê tu guhertinan pêk neyîne û zihniyeta olperest a paşverû wê serdest be, ew jî mîna rêjîma Baas e, lê tenê kirasekî nû li xwe kiriye. Lê gelên Sûriyê yê ku ji bo demokrasî û wekheviyê berdêlên giran dan, wê bi tu rengî sîstemeke paşverû û olperset qebûl nekin.R-4






## ‘Jinên kurd pêşengtiyê ji guhertina çarenûsa tevahî jinan re dikin’

Cîgira Hevserokatiya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mistefa da zanîn ku jina kurd destkeftiyên giran bi şoreşa 19’ê Tîrmehê re bidest xist, ji bo guhertina çarenûsa jinên Sûriyê jî xebat dike.R-2

# 'Jinên kurd pêşengtiyê ji guhertina çarenûsa tevahî  jinan re dikin'

Cîgira Hevserokatiya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mistefa da zanîn ku jina kurd destkeftiyên giran bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re bidest xist, ji bo guhertina çarenûsa jinên Sûriyê jî xebatê dike û got: "Divê jinên kurd li çar aliyên cîhanê bi hevgirtina xwe xwedî li destkeftiyên şoreşê derkevin."

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Di geşedan û rêkeftinên ku di ser asta Sûriyê de hatine jiyankirin de û bi taybet bi hatine HTŞ'ê li ser desthilatdariyê, rewşa Sûriyê ber bi aloziyeke kurtir ve herikî, ku zêdetirî 13 salan ji şer û qeyranan gelê Sûriyê êdî nefesstandin jê re nema. Lê bi hatine HTŞ'ê re ew gel ber bi rewşeke xirabtir ve çû. Ji sîstema dîktator ya rêjîma Baas derbasî sîstemeke nijadperest, olperest û desthilatdartir bû. Pê re rewşa jin aloztir bû û siysetekî olperest li ser jina Sûrî tê sazûmankirin.

Derbarê mijarê Cîgira Hevserokatiya Kongreya  Neteweyî ya Kurdistan KNK'ê Hêvî Mistefa ji rojnameya me re axivî.




**'Jinên Kurd bi hevgirtina xwe pêşengtiyê ji jinên Sûriyê re dikin'**

Hêvî Mistefa di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku jinên Kurd di Sûriyê de ji bo guhartina zihniyet û mafê jinê pêşengtiyê dikin û got: "Destkeftî û gavên ku jina Kurd li ser asta cîhan û Kurdistanê davêje, gavên dîrokî ne ku tê de ji bo guhartina çarenûsa jinê şer dike û siyaset dike. herî dawî me dît ku konferansa netewî a jinên Kurd li Sûriyê hate lidarxisatin. Ev konferans pêwîsiyek bû ku bihatiba li darxistin. Destpêka aloziya Sûriyê a ku hatiye destpêkirin. Jina Kurd amedebû û xwe birêxistin kir. em niha careke din dibînin ku  jina kurd ji bo guhartin û rewşa ku di Sûriyê bi taybet de tê jiyan kirin hevgirtina xwe bi xebatê xwe nîşan didin. Rewşa heyî bi ziraviyên wê nîqaş dikin û ji bi guhartina rewşa jin di Sûriyê de pêşengtiyê li hember sîstem û zihniyeta nû a serdest dikin".

**'Jina kurd pêşengtiyê ji pêvejoyê re dike'**

Hêvî Mistefa da zanîn ku KNK'ê zêdetirî 25 saln e ji bo yekîtî û hevgirtina Kurdan û gelan kar dike û wiha pê de çû: "Bi rastî KNK'ê zêdetirî 25 sala ne ji bo hevgirtina kurdan û gelan kebar dike û heyanî vê kêliyê jî dîrokeke tijî destkeftî û xebat xêzkiriye. Di demên dawiyê de KNK'ê Rojava ji bo amedekirina konferansekî şêwra netewî kar dik, ku dê de hemû kurdên Rojava beşdar bibin. Lê me dît ku jina kurd careke din xwe îsbat kir û konferansa netewî a jina kurd di Sûriyê de lidarxistin.

Çawa ku jina kurd pêşengtî ji vê şoreşê re kir û gihand asta ku dengvedaneke dîrokî bi silogana Jin Jiyan Azadî li hemû cîhanê avabibe. Divê em ji bîr nekin di qada leşkerî, bîrdozî, siyasî, dîplomasî û civakî de jina kurd cihê xwe tê de girt û em niha vê rêxistbûyînê di şexsê tevlîbûn û birêxistinkirina bi hezaran ji jinên hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ji lewra jina Kurd li kuderê dibe bila bibe divê bi yek destî, yek helwestê bibin yek û bi hevgirtina xwe pêşengtiyê ji jinên cîhanê re bike."

**Erkên dîrokî li ser milê jina Kurd e**

Hêvî diyar kir ku Sûriyê desrbasî pêvajoyeke nû bûye û jina Kurd wê li ser du eniyan şer bike û wiha domand: "Piştî rûxana Rêjîma Sûriyê em dizanin ku Sûriyê kete qonaxekî nû. Di vê pêvajoyê de erka li ser me girantire, destûra ku bê avakirin divê çawa be, gelo çareseriya pirsgirêka Sûriyê çi ye, rengê ku bê avakirin divê çawa be? Ev hemû erkin û divê di siberoja Sûriyê de cihê me hebe. Ji lewra erka li ser jina kurd di Sûriyê de girantire û du erkên wê hene yek; pêwîste nîqaş bikin ku çawa nasnameya xwe a kurdî biparêzin û çawa mafê xwe ku jina kurd û gelê kurd in di Sûriyê de biparêz, ya din li hember zihniyek nîqaşkirina nasnameya xwe a zayendî ku mafê wê misoger be, herwiha bi jinên Sûriyê bi hebû pêkhateyên wê bi hev du re bidinûbistînin û di diyarkirina çarenûsa xwe de û nivîsandina destûra nû de neyên paşguhkirin. Ji lewra pêwîste jina Kurd di sûriyê de weke rewşa jinên di hemû şoreşên



berê yên dîrokê de nebe. Xwedî li ked û hebûna xwe derkeve".

**`Divê jinên kurd li Kurdistan û Ewropayê xwedî li destkeftiyên şoreşê derkevin`**

Cîgira Hevserokatiyê a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê Hêvî Mistefa wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Di van demên dîrokî de em bang li jinên Kurd li Kurdistan û Ewropayê dikin ku ji vê pêvajoya dîrokî re bi jinên Rojavayê Kurdistanê re bibin yek û hevgirtina xwe derxînin. Ji ber êşa me weke kurd û jin yek e, her wiha xeteriyekî mezin li ser destkeftiyên Şoreşa Rojava û a jinê  heye, ger em rojava winda bikin emê hemû Kurdistanê winda bikin. Divê jinên kurd bi insiyatîfa xwe van destkeftiyan biparêz in. Her wiha em bang li hemû jinên aştîxwaz û demokrat di cîhanê de dikin ku ew jî bibin dengê şoreşa jina azad û xwedî li destkeftiyên vê şoreşê bikin."

# 'Em destûra nû a Sûriyê ku mafê jinê paşguh dike qebûl nakin'

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

**Nûnera Partiya Nûjen û Demokratîk li Sûriyê Heyfa Mehmûd diyar kir ew danezana destûra nû a Sûriyê qebûl nakin û wiha got: "Ji destpêka şoreşê ve û heta niha jinên Rojava kar û xebateke bêhempa didin meşandin, destûra ku jinan paşguh bike, em wê destûrê bi tu awayî qebûl nakin."**

Tevî ku Sûriyê piştî hilweşandina rêjîma Bass derbasî qonaxeke nû bû, lê ji aliyê mafê jin, demokrasî, edalet û wekheviyê tu guhertin pêk nehatin. Ji ber ku hişmendiya desthilatdariya Şamê ya nû ji hişmendiya Bassê ne cudatir e. Ew dixwaze rola jin paşguh bike û bi rêya olperestiyê desthilatdariya xwe bide meşand. Li hemberî wê jî jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê asta têkoşîna xwe bilindtir dikin û ji bo bidestxistina mafên xwe bi israr tevdigerin.

Derbarê rol û rewşa jinê di Sûriyê de Nûnera Partiya Nûjen a Demokratîk li Sûriyê Heyfa Mehmûd ji Rojnameya me re axivî.



**'Ji destpêka şoreşê ve jin xebatekî pîroz dide meşandin'**

Heyfa Mehmûd anî ziman ku ji destpêka şoreşa Rojava û heta roja îro jin xebateke pîroz didin meşandin û wiha got: "Jin ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ve kar û xebatekî pîroz daye meşandin. Ev xebat ne ji ber xwe ve hate meşandin, ji ber ku bingehekî wan ya rêxistnî bi salan hatibû pêşxistin. Ew jî xwe disipêre xebatên Tevgera Azadiya Kurdistanê ku ji salên 80'î ve hatibû destpêkirin. Piştî şoreşa Rojava dest pê kir, jinê xwe birêxistin kir û cihê xwe di her qadê de girt; weke qada siyasî, leşkerî, civakî, abûrî û hwd. Jin di nava şoreşê de bi rola xwe rabû û xwe diyar kir. Ji ber ku jin bi rola xwe rabû û xwe birêxistin kir, wê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pir gavên girîng ji bo bidestxistina tevahî mafên jinan, avêtin."

**'Em danezane destûra Sûriyê a nû qebûl nakin'**

Heyfa Mehmûd da zanîn ku desthidariya Şamê mafê jinê di danezana destûrê de napejrîne û paşguh dike û wiha berdewam kir: "Dema ku danezana destûra Sûriyê hate ragihandin mafê gelek pêkhateyan hate paşguhkirin, herwiha  û mafê jinê jî hate paşguhkirin. Destûra ku jinan paşguh dike em wê destûrê bi tu awayî napejirînin.Di heman demê de desthildariya Şamê bi hişmendiya rêjîma Baas desthildariyê bi rê ve dibe, herwiha em dibînin ku li herêmên di bin desthildariya Şamê de û bi taybet beravên li Sûriyê rojan e jin rastî kuştin, destdirêjî û tecewizan tê. Dema ku sîstem desthidariya Şamê bi vî awayî were meşandin em ê vegerin sîstema rêjîma Baas, wê careke din mafê jinê were çewsandin, wê demê jin nikare mafê xwe tesbît bike. Ev sîstema ku were avakirin mafê jinê lê neyê tesbîtkirin, wê ew sîstem qels û lawaz be, lê em di wê baweriyê de ku jinên Sûriyê û bi taybet jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê karbin gaveke pir mezin bavêjin û wê mafên xwe di destûra Sûriya nû de bidest bixin. Em dibînin ku jina Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşengtiya civaka xwe dike û rojane asta têkoşîn û berxwedaniya xwe xurtir dike, gavên mezin tên avêtin û jina kurd dengê xwe dighîne hemû jinên ku li Sûriyê jiyan dikin. Gelek têkilî bi jinên li derveyî Sûriyê re jî hatine avakirin û ji bo  pirsgirêka jinê li Sûriyê were çareserkirin, wê têkoşîna me dewam bike."

**'Pêwîst e jin yekîtiya xwe ava bike'**

Nûnera Partiya Nûjen a Demokratîk li Sûriyê Heyfa Mehmûd eşker kir ku jina kurd bi têkoşîna xwe bala her kesî li cîhanê kişand û axaftina xwe wiha qedand: "Îro cîhan bi tevahî ji têkoşîn û berxwedaniya jinê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê matmayî dimîne, bi taybet jina kurd bi zanebûna xwe bala her kesî kişand. Niha gelek rêxistinên jinan yên cîhanê bala wan li ser jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, dixwazin alîkariyê pêşkêşî jinên herêmê bikin da ku jin mafê xwe bidest bixe. Ji ber vê yekê pêwîst e pergala Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibe pergaleke ji bo tevahiya Sûriyê. Rêveberiya Xweser di hemû aliyan de axwe gihandiye asta herî jor. Di heman demê de jinê jî di hemû qadan de xwe gihandiya asta herî jor. Bangewaziya min ji tevahiya jinan re ku xwe birêxistin bikin û yekîtiya xwe li ser asta Sûriyê ava bikin."



# 'Huner peyama aşitî û hezkirinê ye'

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo destnîşan kir ku huner peyama aşitî û hezkirinê ye û wiha got: "Firçeyên me êş, derd, îrade û hêza gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi hêviya azadiyê ne hilgirtiye. Em bi hêvî ne ku tabloyên êşê veguhere xêzkirina rengên jiyanê û xweşikbûna di herêmê de."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo bi firçeya xwe tabloyên nêzî rastiya civakê dineqişîne, bi tiliyên xwe li ser kaxizên spî rengên jiyanê xêz dike û dihêle ku çavên mirov rasterast bên ser berhemên wî.

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo sala 1958`an li bajarê Qamişlo ji dayik bûye, wî ji zarkotî ve ji şêwekariyê hez dikir, lewma ev xebat ji mêj ve da meşandin. Derdora ku lê jiyan dikir hişt ku vê jêhatiyê berdewam bike, herwiha zarokan ji berî 50`î salî ve lîstokên ku ji bermahiyên têl û qotiyan çêdikirin fêrî afrandinê bûn. Mihemed Emîn Ebdo di atmosfereke gundewarî û çandiniyê de jiyan kir, herwiha bi kesayetên kevin jî bandor bû.

**Xwendina şêwekar Mihemed Emîn Ebdo**

Mihemed Emîn Ebdo piştî xwendina bekeloriya, jê re weke xeyalekî bû ku hunerê bixwîne, lewma biryar da ku jêhatiya xwe pêşbixe û bi awayekî ekadimî berdewam bik. Wê li zanîngeha Şamê beşê Hunera Bedew xwend. Di wê demê de ji hezar xwendekarên ku navên wan hatibû



tomarkirin, tenê 150 xwendekar hatin qebûlkrin û ew li ser 5 beşan dihatin dabeş kirin. Ew di fakulteyê de fêrî çandên din yên di Sûriyê de, hunera cîhanî, dîroka hunerê û çanda hunerî ya berfireh; bû.

Piştî xwendina çar sala şêwekar Mihemed Emîn Ebdo xwendin qedand bi pileya herî baş.

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo diyar kir ku derdê herêma Cizîrê hilgirt ser xwe, lewma di tabloyên wî de piraniya mijaran bal dikşand ser êşa herêmê.

**Her şêwekarek di nava wî de dibistanek heye**

Tevahî tabloyên şêwekar Mihemed Emîn Ebdo xwedî name bûn, lê nameya herî giring ku çawa derdor, exlaq, dîrok û têkiliyên mirovahî îfade bike, bi taybet li herêma Cizîrê ku taybetmendiyeke wê herî xweşik heye. Hevgirtin û hezkirina di nava hemû pêkhatyan de derdixe di riya tabloyên xwe de.

Derbarê hunera şêwekariyê, şêwekar Mihemed Emîn Ebdo ji rojnameya me re axivê.

Mihemed Emîn Ebdo di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Li cem her şêwekar an hunermendekî tecrûbe û şêwazeke taybet heye, ev encama derdora ku lê jiyan kiriye û jê bandor bûye. Her şêwekareke di nava xwe de bûye dibistanek ji qalibên komî derketine û bi azadî hunera xwe îfade dike. Ji ber ku tu sînor ji hunerê re tune ye, her hunermend firkên wî yên cuda hene. Huner bû wesîleyek giring da ku mirov hest, fikir û ramanê xwe yên ku dijî derxîne holê."

**'Ji ber paşguhkirinê berê xwe didan koçberiyê'**

Mihemed Emîn Ebdo bal kişand ser dema salên berî 2011`an û wiha got: "Hunermendan nikarîbûn weke niha rola xwe bilîzin, dûrxistina hunermendan li ser hemû astan hebû ne tenê asta şêwekariyê, lewma piraniy hunermendan berê xwe didan koçberiyê. Piştî şoreşê vekirin û azadî çêbû ku weke hunermend hestên xwe bînin ziman, em dixwazin huner bikeve xizmeta civakê, em bikaribin di riya hunera xwe hezkirin, aştî û azadiyê di nava civakê de belav bikin."

Mihemed Emîn Ebdo diyar kir ku ew hewil dide li Rojavayê Kurdistanê hunermendên nû taşwîq bike, tecrûbeya xwe bide nifşên nû û wiha domand: "Nifşê nû yên ku di van bûyerên zehmet re derbas bûn derfet ji bo wan tune bû, me hewil da ku derfetê bidin wan ku hestên xwe bînin ziman û karê hunerê bikin di riya fakulteya hunera xweşik bi awayekî akademî, kesayeta xwe pêş bixe li ser asta huner. Herwiha em karibin xwe îsbat bikin li ser asta cîhanî."

**'Hêviyên me xurtin'**

Ebdo wiha got: "Tecrûbeya me nû ye lê hêviyên me xurtin ku wê di pêşeroja me de hunerke xweşik di herêma me de çêbibe, em ji hunermend û nifşên nû yên ku xwedî enerjî ne sûd bigrin, fakulteya hunera xweşik tenê salê 10 xwendekara derbiçin bese, dibe ev 10 xwendekar 20 xwendekarên din fêr bikin û hwd.. wiha huner belav dibe."

Ebdo wiha zêde kir: "Di dema heyî de şert û mercên taybet hene, êriş li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriya heye, mixabin ku hin alî hene naxwazin aştî û aramî li Sûriyê pêk were, me hewil da fedekariya ku gelê me pêşkêş kir li ser bendava şehîdan derxînin seranserî cîhanê di riya tabloên xwe."

**'Bendava Tişrînê mîna tabloya Guernîka Picasso nîşan dide'**

Ebdo bûyerên bendava Tişrînê mîna tabloyeke Guernîka Picasso nîşan da û wiha got: "Dema ku bajarê Guernîka yê Baskê hate bombebaran kirin, îro heman tablo hate dûbare kirin li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê, me hewil da di riya tabloyên xwe nameya xwe bighînin cîhanê ku van êrişên hovane bisekinînin, em weke Sûrî pêwstiya me bi azadiyê û hevgirtinê heye da ku em xwe ava bikin, dûrî zimanê şer û kuştinê bin. Em bi hêvî ne ku rojên bê baş bin, aştî ji bo tevahî herêmê pêk were, hezkirina di navbera gelan weke gelên cîhan bi aramî û azadî jiyan bikin, ev nameya me ye."

Şêwekar Mihemed Emîn Ebdo wiha dawî li axaftina xwe anî: "Huner peyama aştî û hezkirinê ye û firçeyên me êş, derd, îrade û hêza gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi hesreta azadiyê ne hilgirtiye. Em bi hêvî ne ku xwînrijî bê sekinandin, êdî tabloyên êşê veguhere xêzkirina rengên jiyanê û xweşikbûna di herêmê de."

# 'Di lêkolînê de şîkariya rêzimanî li gorî metoda zimannasiyê tê dîtin'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Nivîskarê kurd Berzo Mehmûd bi berhema xwe ya bi navê 'Hin Mijarên Rêzimana Kurmancî Li Ber Ronîya Zimannasiyê' pirtûkxaneya kurdî zengîn kir. Derbarê wê de Mehmûd da zanîn ku pirtûka wî şîkariya rêzimanî, morfolojî û dengsazî di van lêkolînan de li gor metoda zimannasiyê vedihewîne.**

Pirtûka bi navê 'Hin Mijarên Rêzimana Kurmancî Li Ber Ronîya Zimannasîyê' lêkolîna nivîskarê kurd Berzo Mehmûd e ku îsal ji hêla HRRK'ê ve hatiye çapkirin. Berzo Mehmûd lêkolîn derbarê rêziman û rastnivîsa kurmancî kiriye û 17 mijarên cihêreng xistine qada şîrovkirin, lêhûrbûn û lêkolînê. Nemaze; Rêbazên lêkolînkirina Rêziman, fonêm di zimanê kurdî de, morfolojiya ziman û hwd... Hêjayî bibîrxistinê ye ku 24 berhemên nivîskar Berzo Mehmûd bi zimanê kurdî û erebî hene, ya herî dawîn jî pirtûka Hin Mijarên Rêzimana Kurmancî Li Ber Roniya Zimannasiyê.

Têkildarî berhema xwe Berzo Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

**'Pirtûka min a rêziman, lêkolînên rêziman û rênivîsa kurmancî vedihewîne'**

Mehmûd da zanîn ku wî gelek mijar girêdayî rêziman û rênivîsa kurmancî kiriye qada lêkolîna xwe de û wiha got:"Lêkolîna rêziman babeteke herî giring e di serdema hevçerx de, ji ber wiha zimannasên cîhanê gelek hêz berdane ser vî milî, bi taybetî ji destpêka sedsala 20'an ve, piştî ku Ferdinand Du Saussure ev babet xiste kirasekî zanistî ku pêwîstiya ziman bi mîtodên wesfî heye ji bo lêkolîna ziman û naskirina rûyê rast û drust di movikên wî de, li ser gelek astan ji deng û fonêm bigire ta morfolojî û ristesazî û watasazî. Ev hemî bi hev re hevdû temam dikin. Ev lêkolîn hewldaneke ji bo bersivdana pirsên derbarî mijarên rêziman. Şîkariya rêzimanî di van lêkolînan de li gor metoda zimannasiyê xwe belû dike ku dengsazî û morfolojî pirtir cih têde girtine. Li gor dîroka ku ev babet têde belav bûne sînorê fikrê rêzimanî destnîşan dike, ku tu lêkolînên zimannasîyê di zarê kurmancîya rênivîsa latînî de berî van nivîsaran belav nebûbûn. Ji bilî ku hin mijar cara yekem di kurmancî û di soranî de tê belavkirin."

**'Mijarên lêkolînê ji nivîserên sala 1993'ê û şûnve'**

Berzo Mehmûd destnîşan kir ku çend lêkolînên kevnar derbarê rêzmana kurmancî de hene û wisa domand: "Ev pertûk çend lêkolînên derbarê rêziman û rênivîsa kurdiya kurmancî bi xwe digire ku min di salên bûrî de di kovarên kurdî yên Rojava de û hin ji wan dervî Rojava de belav kiribûn, her mijareke dîroka belavkirina wê û nav û jmara kovarê li ber hatiye nivîsîn. Hin ji wan di sala 1993'an de hatine belavkirin û yê din di 2017'an de, lê piranî di salên navbera 1993'an heta sala 2006'an de hatine belavkirin. Ji bilî  ku min pertûkek di sala 2005'an de li Rojava belav kiribû, lê gihişte destê piranîya rêzimannivîsên Rojava û Bakur. Di vê çarçoveyê de bîrokeyên derbarê rêziman, rênivîsê û têrmên wan bi zelalî hatine ronîkirin û çespandin. Lê beşa yekem û duwem di vê pertûkê de vê dawîyê hatiye nivîsîn. Mijarên vê pertûkê komek ji nivîsarên min in ku ji sala 1993'an ve destpê dike ta sala 2005 û li dawî lêkolîna Kopyula ku sala 2010'an de belav bû."

**'Min xwendineke têr têkildarî rêzimanên kilasîk kir'**

Mehmûd diyar kir ku wî di pirtûka xwe de lêvegerek derbarê rêzmana kilasîk kiriye û wiha anî ziman: "Gava yekem ji bo min ew bû nûjenkirina têrmînolojîya kurdî û lêkolîna li ser cewherê pirsgirêkên ku di pêşdebirîna termînolojîyê de dibin asteng, bi ser



ku min têrmînolojîya Bedirxanî di nivîsên xwe de ji roja pêşî ku min dest bi nivîsînê kiriye, bi kar neaniye. Min xwendineke têr di berhemên rêzimana klasîkî de kir, wek Celadet, Kamîran, Qenat, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd û Sadiq Behaedîn Amêdî. Herweha pertûkên rêzimana dibistanên Başûrê Kurdistanê wek Nûrî Emîn, Mesûd Mihemed, Kurdistan Mukiryanî, Ewrehman Hacî Marif û hwd... Min dît ku zimanzanên her du zarên kurdî, Bakur û Navîn, di  têrmînolojiyê de û şîrovekirina rêzimanê kurdî de ne wek hev in. Min ji xwe re got ka ez çi bikim, serê min tevlihev bû, kêşe aloz e, ez giham wê nêrînê ku berî her karekî, ez tiyorîya zimannasîyê û têrmînolojîyê bi zimanê ingilîzî baş bixwînim. Nemaze ya damezrênerê wê ku Wuster bû, min binemayên têrmînolojiyê nas kirin, piştre min têrmên ku nav destê me de hene li bêjingê xistin û min riya hilbijartinê girt. Ev yek baştir e ku ez têrmên nû bidim, her ev bû rêbaza min."

**'Min xwest têrmên zaraveya kurmancî û soran bikim yek'**


Nivîskar Berzo Mehmûd anî ziman ku armanca wî nêzkirina têrmên kurmancî û soranî bû û wiha axivî: "Min têrmên Celadet guncaw nedidîtin, min komek têrmên hin nivîskarên zaraveya soranî bi kar anîn piştî lêkolîneke dûdirêj di nav bêndera zimanansên zarê soranî de. Ya dîtir jî min dît ya baş ew e ku her du zarên kurdî di buwara têrman de bibin yek dê alîkarîya têgehiştina zimanê mêta ziman bike. Helwesta zimannasên kurmanc despêkê dijî min bûn, li xwe ne xweş tanîn, lê nediwêrîn nêzîkî min bibin, ji bo nimûne careke di sala 1999'an de min gotarek bi navê paşgira (er)  di Kovara Gelawêjê ya li Sûrî belav dibû, min belav kir. Camêrekî ez tometbar kirime ku ez bi zimanekî sormancî dinivîsim, vê paşiyê piştî 12 salan nû têgihişt ku ew şaş e, wî dev ji têrmên xwe geriye û da ser rêya min. Ji xwe wilo baş e. Li hêleke din belavkirina têrmînolojîya zimannasîyê bi bijartina herî baş li gor dîtina min di nivîsarên min de berbiçav e. Mixabin, şaşiyên tîpçinînê(tenddîd) û yên çapê di pertûkên min de hene, bi taybetî di pirtûka minî ya dawî de ya bi navê (Hin Mijarên Derbarî Rêzmana Kurmancî). Lê dîsa ziyanê nagihêne naverokê."

# Kevneşopiya Satî

Rêber Apo di peyama xwe ya 8'ê Adarê a di çarçoveya banga Aşitî û civaka Demokratîk de ku ji jinan re şandibû, balê dikşîne ser tekoşînan jinan a ji bo azadiyê. Herwiha Rêber Apo bahsa çanda "Satî' jî dike. Sedema wê jî ew dixwaze feraseta ku koletiyê li ser jinê ferz dike, çawa ev feraset şîn bûye û di hemû qadên jiyanê de beden, giyan û ramanên jinan wekî makîneyê dibîne, nîşan bide.

**Navenda Nûçeyan**

Rêber Apo di hevdîtina bi endama heyeta Îmraliyê Pervîn Bûldan re xwestibû ku kevneşopiya satî lêkolîn bike, heman demê de di nameya 8'ê Adarê a ku ji bo jinan şandibû de jî behsa kevneşopiya satî dike. Kevneşopiya Satî mijarek ku jin bi giştî lêkolîn bikin bi naverok û encamên xwe ji aliyê tekoşîna jinê ve xwedî girîngiyeke mezin e. Rêber Apo çavkaniya ku mîtolojiya hîndû pê xwedî dibe wiha vegotibû" Hîndû teolojiyek pir rêngî pêk tînin, xwedayên mezin yên ku mirov nikare bihêjmêre pêk tînin. Di mîteolojiyên wan de bondora kûr a Sûmeran tê dîtin teolojiyên wan ji ber ku koka xwe ji derva distînin û ji qabîliyeta mirovan bê parin hişê mirovan tevlîhev dikin. Vegotinên mîtolojîk ên ku destpêkê bi awayê vegotinî tên ragihandin, bi demê re veguherin darazên civakî, kevneşopiyan, pergala hiqûqî ya mêrê serdest û bi pêşketina avayiya dewletê re, veguheriye yasayan û hebûna xwe bidest xistiye. Kurteya çîrokek dirêj, di domandina hebûna sîstema koletiyê ya ku îro li ser jiyana me hemûyan bandora xwe nîşan dide. Mît, Xweda, zindiyên nîv xwedayî, derbarê leheng, ajal û bûyerên sirûştê yên di pêşketina civakê de rolek girîng lîstine de, agahî dane, yan jî bi rêya wan hinek daxuyanî hatine dayîn. Bi vê yekê re ji ber ku mîtan bang li qadeke ku sînorên aqil û mentiqê derbas dike kirin e, ji bo ku baştir bê famkirin û ragihandin, ji aliyê mirovan ve bi awayek dramatîk



hatine pêşkêşkirin.

**Perçiqandina jinan bi awayekî îdeolojîk**

Lewma jî mirov, hem ji ber ku zindiyek ku mîtan ava dike wek "mîtojenîk" hem jî ji ber ku objeya mîtan e, wek zindiyek "mîtolojîk" tê pejirandin. Mît ji mirovan re derbarê zindiyên sersirûştî, koka gerdûnê, alema fizîkî û metafizîkî de agahiyan pêşkêş dikin. Di heman demê de hişmendiya civakî, nêrîna çandî, kevneşopiyan û ferasetek jiyanê dide qezenckirin. Pevçûna di navbera sîstema ku civakîbûna li dora jinê bipêş ket hilweşandiye û nirxên jin-dayîkê de derketiye holê, wek Şerên Xwedaxwedawend hatiye pênasekirin. Van çîrokan veguherandine vegotinên mîtolojîk ên li ser kuştina xwedawendan û biçûkxistina wan. Di vê hêlê de perçiqandina jinan a di jiyana civakî de, bi awayê îdeolojîk hatiye avakirin. Ferd, bi rêya van mîtan bi civaka ku tê de dijî re yekpare bûye û fêr bûye ku ewê çawa bijî û çawa tevbigere. Bi vî awayî, ehlaqa ku di civaka xwezayî de hebûna xwe pêk aniye, di nav demê de guheriye û ketiye xizmeta feraseta bavsalar.

Her civakek, xwedî mîtên ku bi zimanek cewherî yê mîtolojîk û wêjeyî hatiye vegotin e. Her çîrokek aydê dewra Xwedayan û Xwedawendan, rastiya ku jinan û civakê kişandiye nav xwe, radixe ber çavan. Heqîqeta bingehîn a di vir de jî, her çîrokek mîtolojîk a ku hatiye vegotin, her çiqas bi nav û versiyonên cuda li herêmên din ên erdnîgariya dinyayê bên jiyîn jî, di hêla civakî de rola ku ji bo jinê hatiye diyarkirin û mijara ku ew xistinê, neguheriye. Yanî çîrokên mîtolojîk, xwedî çawaniyek gerdûnî (global) in û ji bo ku em pêşketina pergala bavsalariyê fam bikin, gelek saloxan pêşkêş dike.

**kevneşopiya satî**

Satî, peyveke bingehîn; Wateya jina dilpak û dilsoz e. Li gorî çanda kevneşopî ya Hindistanê û Hinduîzmê, jina ku hevjînê wê wefat dike; Bêbextî, feqîrî û bextreşiyê tîne . Jina ku piştî wefata hevjînê xwe dibe sembola bextê xerab, xerabî û gunehkariyê, neçar e ku xwe red bike (xwe li keşîşxaneyê bigire, xwe ji dinyayê qut bike) an jî li gorî kevneşopiya satî tevbigere û bi mêrê xwe yê mirî re bi saxî bişewitîne. Jina ku naxwaze bi mêrê xwe yê mirî re were şewitandin, nikare ji nû ve bizewice. Jiyana xwe ya mayî bi jiyaneke bêçare û belengazî derbas dike, ji her cure kêfê dûr dimîne. Di Hinduîzma kevneşopî de, mirina hevjîn cezayek e ji bo gunehên berê yên jinê ye. Rihê jina ku bi mêrê xwe yê mirî re xwe pêşkêşî mirinê neke, dê di laşê kastek jêrîn de, di laşê heywanek de cîh bigire, an jî dê di jiyana xwe ya pêş de wekî jinek çêbibe. Li gorî baweriya kevneşopî ya Hindu, vegera li cîhanê wekî jinek wekî nifirek mezin tê dîtin. Di dawiya merasîma Satî de, jina şewitî tê pîrozkirin û qada ku merasîma Satî lê tê lidarxistin, wekî qada pîroz tê dîtin. Tê bawerkirin ku yên ku serdana vê herêma pîroz dikin hecî ne.

Kesên ku ji bo rakirina kevneşopiya satî ku binpêkirina mafên mirovan e ku ji sala 400'î a zayînê vedigere, çalakî li dar xistin. Ev çalakî pêşî ji aliyê tirkên ku demeke dirêj li Hindistanê serdest bûn, hatin destpêkirin. Di heyama ku Hindistan ketibû bin desthilatdariya Brîtanyayê de, di sala 1826'an de li herêmê di bin serweriya Şîrketa Hindistana Rojhilat de pratîka sati hate qedexekirin û di sala 1856'an de qanûnek ku destûr dide jina ku hejînê wê wefat bibe bizewice hate derxistin. Di sala 1861'an de, pratîka sati li seranserê Hindistanê hate qedexekirin. Piştî ku Hindistan di sala 1947'an de serbixwe bû, ew pêkanîna sati neqanûnî dît. Mahatma Gandî, rêberê giyanî û parêzvanê mafên mirovan ê Hindistanê jî ji bo ji holê rakirina kevneşopiya sati çalakî li dar xist. Îro, kevneşopiya sati hîn jî berdewam e.

**Laşên ku di agir de dişewitin**

Şewitandina Satî bi agir, xwe fedakirin an jî fedakariya wê ya bi zorê jî bi baweriya pîroziya agir ve girêdayî ye. Ev çîrok, dişibihe efsaneya Hz. Birahîm ku ji ber ku pûtên Nemrûd şikandiye û ev agir dibe Balîklî Gola Rihayê. Bi heman awayî, veguhertina parçeyên laşê Satî bo perestgehan û derketina çavkaniyên ava pîroz ên girêdayî van perestgehan jî vegotineke mîtolojîk e. Bê guman, ji bilî ku ji vê wekheviyê wateyekê werbigirin, giranî li ser wekheviya efsaneya avêtina agir heye.

Dibe ku ev çîrok jî vebêje ka merivên ku li cem jinan radiwestin, çawa ji hêla Şaman û xwedayan ve hatine organîze kirin û piştre ji jinan hatine veqetandin. Tê zanîn ku bi pêşketina civakbûna yekemîn re jin û mêr di çarçoveya feraseta jiyana hevpar a azad de hevkarî ava kirin û ev demeke dirêj jiyan kirin. Mîta Satî bi serdemên ku zihniyeta baviksalarî dixwest xwe weke serdest bi cih bike re têkildar e. Ji wir, ev çîroka mîtolojîk paşê vediguhere çîroka Satî, ku xwe ji bo mêrê xwe dike qurban. Zîhniyeta baviksalarî bi pêşkêşkirina vê efsaneyê weke pêwîstiyeke civakî, dibe ku çîroka orîjînal berovajî kiriye û li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve şîrove bike.

# Bajarê Amûdê; dilê çand û dîrokê ye

**Dilovan kêfo/Amûdê**

**Yek ji bajarên herî kevnar ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bajarê Amûdê ye. Amûdê bi dîroke xwe ya kevnar navdare û xwedî civakeke hevgirtiye.**

Bajarê Amûdê bi cihêrengiya çandî tê naskirin û sembola çand û dîroka kevnar e. Ew yek ji bajarên Rojavayê Kurdistanê ye û li ser xeta sînor ya d navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê cih girtiye. Li Rojhilatê wê bajarê Qamişlo ye, li Başûrê wê bajarê Hesekê ye û li Rojavayê wê jî bajarê Dirbêsiyê ye. Çemeke biçûk bi navê çemê Xenzîr di navnda bajêr re derbas dibe. Li gorî dîrokzanan Amûdê di destpêka dehsala sêyemîn a sedsala bîstan de, hatiye avakirin. Amûdê di sala 1936'an de ji aliyê Ferensiyan ve rastî bomberdûmaneke hewayî hat. Fransa erd şewitand û piştre bi 5 balafiran êrişî bajêr kirin. Ev dîrok bi dîroka "El-Toşa" tê zanîn. Nayê zanîn çima navê bajarê Amûdê, bûye Amûdê? ji ber ku di derbarê sedema navê wê de gelek gotin hene ku bi riya kal û pîr me çîrokeke efsanewî belav dikin û dibêjin keça Padîşahê Mêrdînê, biryara darvekirina kurê xwe da ku li nêzîkî Girê Amûdê bê darvekirin û dema ku ew ji aliyê karwaneke ku ji wê derê derbas dibû hat dîtin, wekî stûn an amûd hate naskirin. Paşê dema ku gund ava bûye, jê re dibêjin Amûdê. Di vê çîrokê de hûrgulî û guman li ser pêvajoya bûyerên wê hene.

Li navçeya Amûdê 3 girên arkeolojîk hene ew jî evin: Girê "Mozan", girê "Çexir Bazar û girê Şermola. Ev gir şaristaniyên ku ji 3 hezar salî zêdetir in.

**Bûyera şewata sînemayê**

Di 13'ê Cotmehê 1960'î de, bajarê Amûdê bû şahidê kuştina zêdetir ji 200 kesan, ku piraniya wan zarokên dibistana seretayî, xwendekarên (Dibistana Seretayî ya El-Xezalî) ku



temenê wan ne zêdeyî 12 salî bû. Şewata li "Sînemaya Şehrezadê" di dema nîşandana fîlma "El-Mesrî" de li salona sînemayê ku ji bo piştgirîkirina şoreşa Cezairê li dijî Ferensiyan bû, rû da.



# 'Vîna gel ji êriş û komkujiyên dagirkeriya Tirk xurtir e'

Malbata şehîdên komkujiya gundê Berxbotanê yê Kobanê diyar kirin ku bi komkujiyan vîna wan nayê şikandin û gotin: "Em bi şehadeta zarokên xwe ser bilindin û tu carî vîna me li hember êriş û komkujiyên dagirkeriya Tirk lawaz nabe, berovajî wê vîna me xurtir dibe."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Di 17`ê Adara 2025'an de komkujiyeke din ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve hate kirin û li gundewarên Kobanê komkujî li ser gel pêk hat, di encamê de 10 kes ji heman malbatê şehîd bûn û zaroka 9 salî ya bi navê Narîn jî birîndar bû. Narîn niha bê dayik, bav, xişik û bira ma. Bê guman gundê Berxbotanê yê ku êrîş lê hate kirin, beriya niha bûbû hedefa komkujiyeke mezin a DAÎŞ'ê. Niha jî dewleta Tirk a dagirker bi balafirên şer komkujiyeke nû kir. Ev rewş nîşan dide ku daewleta Tirk a dagirker ji her liv û tevgera xwe de tê fêhmkirin ku dixwaze plana nîvco ya DAÎŞ`ê temam bike. Dewleta Tirk a dagirker siyseta qirkirin û dijminatiya li ser gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîn e, kiryar û sûcên şer ên dijî mirovî derheqê sivîlan de pêk tîne û hemû qanûnên navnetewî binpê dike.

Derbarê komkujiya Berxbotanê, dayik û xuşaka şehîd Xezal Ebdo û birayê şehîd Osman Ebdo ji Rojnameya me re axivîn.

Suad Ebdo ku xuşika şehîd Xezal Ebdo di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser jiyana xuşka xwe Xezalê û zarokên wê û wiha got: "Di destpêkê de ez êrişên dagirkeriya Tirk bi tundî şermezar dikim, ev êrişên dagirkeriya Tirk ne mirovî ne, her roj wê zarokan, jinan û zilaman bike armanc. Xuşka min 9 zarokên xwe hebûn, ew ji gundê Girik bûn, ji ber jiyana zehmet û rewşa wan a madî lawaz bû, wan berê xwe dan gundê Qumçê di zeviyekî de kar bikin û karibin debara jiyana xwe bikin. Dagirkeriya Tirk bi awayekî domdar her bi çekên giran û belafirên bê mirov li gundê Berxbotan û Qumçê a girêdayê bajarê Kobanê topebaran dikir. Di 17`ê miha Adarê da dewleta Tirk a dagirker bi çekên xwe yên giran li derdora zeviyê dixist, êdî bi dilekî bê wijdan û mirovî bi belafirên xwe yên bê mirov zevî kir armanc û xuşka min, hevjînê wê ku dibe pismamê min û zarokên wan hatin şehîd xistin, cenazeyên wan parçe parçe bûbûn, hemî biçûk bûn, xuşka min xezalê ducanî bû. tenê Narîn keça xuşka min maye ew jî bi giranî birîndare ku temenê xwe 9 salî ye û heya niha nizanê ku malbata wê bi giştî hatiye şehîd xistin."

**Narîna 9 salî**

Suad Ebdo di berdewamiya axaftina xwe de behsa êşa çûyina xuşk û zarokên wê dike û wiha got: "Tenê niha yê ku ji malbata xuşka min maye, keşa wê Narîn e. Narîn ku niha li nexweşxaneyê de ye, birînên wê jî girane, her



**Suad Ebdo**



**Yasir Ebdo**



**Xanim Hebeş**

cara ku em diçin serdana wê, pirsa dayik, bav, xuşk û birayên xwe dike, belkî dema ku Narîn ji nexweşxanê derkeve, em ê çi bêjin. Em ê çawa lê xwedî derkevin, ji ber ku êşa wê ji a me giştiya girantire, ne tenê yek ji malbatê çûye, malbat giştî çû. Lewma wê li ser wê pir giran be. Ya dim jî keçeke bi tememekî biçûke wê şikandinek li hidirê wê de bimîne. Tenê em dibîjin xwedê ji Erdogan re ne hêle, bila Erdogan bizanb e ku ew ê bi destê me û destê zarokên me were tune kirin. bila ne fikire di cejina de komkujiyan pêk tîne wê morale me bişkê. Em serblindin û hêz û moralê me mezitir bû, em di dawiyê de jî dibêjin em xwe bi qurbana şoreşê bin."

**'Êdî bese ji bêdengiyê re'**

Birayê şehîd Osman Ebdo, Yasir Ebdo Jî êrişên dagirkeriya Tirk bi tundî şermezar kir û wiha got: "Dewleta Tirk a dagirker heya vê kêliyê êrişên xwe yên hovane li ser bajarê Kobanê û gundewarên wê pêk tîne, tenê ez dixwazim vê bîjin, bila bimrin ew kesên ku çav û guhên xwe ji van sûc û komkujiyan digirin, bese êdî pêwîste rê li ber dagirkeriya Tirk bigirin, zarok, jin û bav û kalan dike armanca xwe. Ma çi sûcê zarokekî 4 mehiye ku were topabaran kirin. bimrin ew kesên bê wijdan. Birayê min ji xizantiyê zarok û hevjîna xwe berê xwe dan ziviyan tenê ji bo ku karibin xwe bidin jiyan kirin, li ber saatên sihuran dagirkeriya Tirk dest bi topabaranê kir, bi awayekî hovanê li mala birayê min bombebaran kir, wan hewl dan ku derkevin ji mal û belav bibin, lê dewleta Tirk a dagirker di nava zeviyan de jî wan kie armanc. Dema ez çûn ji bo ku em cenazeyên wan derxînin, dîtinekî karîset bû, hemî bûbûn parçe parçe. Ev êş nayê bi dawî kirin, lê em ê bi vê êşa xwe kîn û neferta xwe li hemberî dagirkeriya Tirk zêde bikin. em ê heya dawê li ser piyan bin û tola wan wê were rekirin. Banga me ew e ku dewletên vaneteweyê û saziyên mafên mirovan xwe bêdeng, ker û lal nekin, êdî bese ji bêdengiyê re, pêwîste dewleta Tirk a Dagirker were ceza kirin û hisabên herî giran jî were xwestin."

**'Em ê bi agirê dilê xwe Erdogan bişewitînin'**

Dayika şehîd Xezal, Xanim Hebeş diyar kir ku ew ê tu carî ji doza xwe paş ve naçin û wiha pê de çû: "Zarokên min hîn biçûk bûn, hevjînê min jiyana xwe ji dest da, 7 keçikên û lawikekî min hebûn. bi zor û zehmetî min zarokên xwe mezin kir, belê Xezalê jî yek ji keçikên min bû. Di sala 2006`an bi pismamê xwe re Osman Ebdo re zewicî. Ew jî bi xizantî jiyan kirin û pir zor û zehmetî dîtin. Ji bo ku zarokên xwe mezin bikin, di heman demê de ji ber ku cejina Remezanê nêz dibe çûn li zeviyekêîji xwe re kar dikirin, ji bo ku di cejinê de cilên nû ji zarokên xwe re bikirin û ew zarok kêm nemînin. Ne bû 15`e rojên wan di zeviyê de, dagirkeriya Tirk di 17`ê miha Adarê de malbatek giştî armanc girit. Ev çi rengê îslamê ye ku di miha pîroz a rojiyê de komkujiyan pêk tîne, îslam ne ev e, îslamiyet ne kuştina zarokan e, bila di bin navê îslamiyetê bes komkujiyan pêk bîne. Bes e ji dagirkeriya Tirk re, ew çi ji me dixwaze ev ax ne axa wiye, heya kengî wê dilê dayikan bişewitîne. Bê guman ez jî wek dayikeke dil şewat dibêjin ku em ê bi wî agirê dilê xwe Erdogan bişewitînin, em ji doza xwe paş ve naçin. Her wiha em bi şehadeta zarokên xwe ser bilindin."

**'Kurd nayên tunekirin'**

Xanim Hebeş di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Raste em bi şehadeta zarokên xwe êşiyan, lê em dizanin ku xwîna wan wê bib rêya azadiyê û tola wan wê were rakirin. Em hemû dizanin ku çawa dagirkeriya Tirk sûcên şer pêk tîne û tevahî cîhan xwe kor dike, wekî ku tiştek nabîne, ez dengê xwe. Êdî bila bi wijdan tevbigerin, îro bi hezaran zarok û malbatên bê sûc li ber topebaranên dagirkeria Tirk de dibin parçe parçe. Êdî bese, mafên me yê jiyan kirinê jî heye, diniya tenê ji bo we çêne bûye heya ku dagirkerî dixwaze me bide qikirin. Lê bila Erdoxan dilê xwe rehet neke, em nayin tune kirin, em her zindî dibin, her ku zarokek me şehîd dikeve en xurtir û bi hêztir dibin."



# ‘Em bi hêviya Sûriyeke demokratîk in’

Hevserokê Meclisa Gelan a kantona Firatê Mihemed Hemdan diyar kir ku pêwîst e desthilatdariya Şamê li gor berjewandiyên tevahî gelên Sûriyê tevbigere û wiha got: “Em bi hêviya Sûriyeyekî demokiratîk in ku di nava xwe de hemû pêkhateyan hembêz bike.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Piştî 13 salan ji kirîza Sûriyê sîstema netewperest a rejîma Baasê hat hilweşandin. Heyet Tehrîr El Şam a cîhadîst ku rêveberiya demkî ava kir, li gorî biryarên wê, tê xuyakirin ku Sûriye ber bi sîstemek olperest ve diçe. Di heman demê de li Sûriya nû bi bêdengiya rêveberiya demkî êrîş, dagirkerî, koçberî û qetilkirin berdewam dikin. Li gelek herêmên Sûriyê QSD ji bo parastinê bang dike. Di vê çarçoveyê de Hevserokê Meclisa Gelan a Kantona Firatê Mihemed Hemdan ji Rojnameya me re axivî.

Mihemed Hemdan da zanîn ku di destûra nû ya Sûriyê de pêwîst e mafê hemû pêkhateyan were nivîsandin û wiha got: “Piştî hilweşandina rejîma Baas`ê, em ketin qonaxeke nû de. Careke din gelên Sûriyê rastî metirsiyê tên. Di dema rejîmê de sîstema netewperest dihat meşandin, îro jî dixwazin rejîmeke olperest bidin avakirin û bi yek rengî Sûriye were birêvebirin. Bi hincetên bi vî rengî li ser neteweyan tiştên ku dixwazin bikin ev e. Şoreşa li Sûriyê pêk hat, ji bo gelek nirxan bû, nirxên demokrasî, jiyana bi rûmet, mafên pêkhateyan û pirsgirêka jinan di hundirê Sûriyê de. Piştî 13 salên bi têkoşîn û berxwedanê, di encamê de rejîma netewperest hat hilweşandin. Di vê qonaxa ku Sûriye tê de derbas dibe, hinek pîvan hene ku pêwîst e pêk werin ji bo ku hevjiyana di hundirê Sûriyê de pêk were û bibe Sûriyayeke demokratîk. Di destpêkê de pêwîst e kongreyek berfireh ku hemû pêkhateyên li Sûriyê dijîn bi wekheviya jin û mêr li ser asta erdnîgariya Sûriyê bi navê kongreyeke niştimanî pêk were. Bi kongreya niştimanî wê lihevkirina jiyanê çêbe û bibe mînaka hevpeymana civakî ku piştî wê neteweyên Sûriyê dest bi nivîsandina Destûra Sûriya ku parastina pîvanên li ser hatine lihevkirin bike.”

**‘Pêwîst e di destûra nû de mafê her pêkhateyekê bê dayîn’**

Hemdan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Piştî helweşîna Rêjîma Baas me texmîn kir ku rewşa Sûriyê ber bi aramî û aşîtiyê ve biçe, lê mixabin desthihedariya Şamê di heman zehniyetê tevgeriya ku di Sûriya nû de mafê hemî pêkhateyan hat xwarin, tenê Sûriya dibînin ya Erebane, lê na; ji destpêka aloziya Sûriyê yê ku Sûriyê ji terorê û dijimin qedand û heya roja Îro şer dike hêzên QSD`ê ne, bê guman di nava hêzên QSD`ê de jî hemî pêkhate xwe dinav de cih kirin. di kêleka wê de jî sîstema Rêveberiya Xweser ku mafê hemî pêkhateyan parest û xwedî li wan derketin bê ferq û cudahî. Lewma pêwîste di destûra nû de mafê her pêkhateyek were bi dest xistin.”

**‘Bila destûra Sûriyê ne li gor berjwendiyên aliyekî be’**

Hevserokê Meclisa Gelan a kantona Firatê Mihemed Hemdan di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêwîste hikumeta Şamê li gor berjewandiyên xwe tevnegere, ji ber ku kesê li gor berjewandiyên xwe tevbigere ew bi ser nakeve û



temenê wê kurt be. Herwiha wek tê zanîn ku rêkeftinên di navbera Colanî û Mezlûm Ebdê hat kirin, ev gavek erînî bû, hêviya me heya ku di derbarê mafê pêkhateyan wê tiştin pir baş werin eşkere kirin û di heman demê de heya niha jî danûstandin di vê çarçoveyê de heye. Em bi hêviya Sûriyekî demokiratîk in ku di nava xwe de hemî pêkhateyan bihewîne û ferq û cudahî tune be. Îro ez yek ji pêkhateyên Erebim lê em ji bo doza kurdan û demokiratiyê li ser piyan e.”

# Li Beravên Sûriyê.. 2 hezar û 246 Elewî hatin qetilkirin

**Zana Roj/Qamişlo**

**Di dîrokê de, ji ber hişmendiya olperestî pêkhateya Elewî rastî gelek komkujî û tundiyê hatine. Di sedsala 21’emîn de jî pêkhateya Elewî li Sûriyê careke din rastî komkujiyeke etnîkî ku cîhan tev bû şahidê wê, hat.**

Mezheba Elewî di sedsala sêyemîn a hicrî de derketiye holê. Ev mezheb yek ji şîeyên tund tê hesibandin, ku li Elî Bin Ebî Talib îddîaya xwedatiyê dikirin Navê wan ê pêşî “Nusiriye” bû û piştî wê jî weke kamuflajekê ji bo gel û ji bo veşartina rastiya doktrîna xwe “Elewî” dihat gotin û niha jî li ser vî navî tevdigerin...

Mezheba elewî vedigere sedsala 9’an ku di nava aloziya siyasî û olî ya cîhana îslamê ya wê demê de derket holê. Baweriya wê ji şîetiya dozdehîmamî û sofîtiyê pêk tê, her wiha bandorên felsefeya gnostîk ku guh dide zanîna hundirîn, li ser wê hene.

Elewê li Tirkiyê hene ku hejmara wan bi milyonana e û piraniya wan li Iîwa Îskenderon dimînin. Di Sûriyê de hejmara elewiyan nêzîkî 1.7 milyon kes e û ji sedî 9’ê nifûsa Sûriyê pêk tînin, ku piraniya wan Sunnî ne. Herî zêde li parêzgehên Laziqiyê û Tertûsê, Hums, Hama û gundewarê Şamê dijîn. Her wiha li Rojavayê Kurdistanê li herêma Efrînê navçeya Mabata piraniya wê Elewî ne.

Her wiha li Îraq, Lubnan û Filistînê jî hejmareke hindik ji elewiyan dijîn.



**Cudahiya bi Sunnetê re**

Elewî di wê baweriyê de ne ku xîlafeta piştî H. Mihemed biçe cem Îmam Elî bîn Ebî Talib, wek ku ew bawer dikin û li gor hedîsên ku bi wan bawer dikin û rêya derketinê di sehîhên sunnî û şîeyan de dibînin.

**Cudabûna bi Şîeyên Îmamî re**

Elewî bi giştî li ser vegotina dîrokî ya serdema Pêxember û piştî Pêxember bi Şîeyan re hemfikir in, lê li ser teoriyên olî, şîroveyên Quranê û rêzgirtina ji bo Elî Bin Ebî Talib ji hev cuda ne. Tişta ku elewî herî zêde li ser disekinin eleqeya wan a bi hiş de ye, ji ber ku ew hişê Resûlê sembolîze dikin.

**Di dîrokê de komkujiyên ku Elewî pê re rûbirû mane**

Bi sedan salan elewî li Rojhilata Navîn rastî çewisandinên sîstematîk ên Împaratoriya Osmanî hatin ku wan wek derveyî îslama fermî ya dewletê didîtin. Ev çewisandin bi ketina Osmaniyan a Sûriyeyê di sala 1516’an de piştî Şerê Mercîdabiqê dest pê kir ku Sultan Selîmê Yekem fermanên olî derxistin û elewî weke zindîq ragihandin û rê li ber komkujiyên berfireh vekir ku hebûna wan dike armanc.

Li Helebê û gundewarê wê, hêzên Osmanî dest bi kuştinên komî kir ku bû sedema qirkirina gelek malbatan, wêrankirina gundan û kolekirina jinan, her wiha mal û milkên wan talan kirin û zeviyên wan ên çandiniyê ji wan hatin standin, lewma ew nava xizanî û tenêbûnê de man.

Beravên Sûriyeyê ji van kiryaran bê par nebûn. Di sedsalên 17 û 18’an de, li herêmên Laziqiyê, Tertûs û Çiyayên Elewiyan hemleyên leşkerî yên dubare li dijî elewiyan pêk hatin, pêre jî bacên giran li xelkê ferz kirin û xelk neçar kirin ku zarokên xwe wek xizmetkar bifiroşin da ku debara jiyana xwe bikin. Her wiha gundên elewiyan ên li Çiyayê Laziqiyê jî hatin şewitandin û wêrankirin, gelek kes neçar man ku koçî herêmên asêtir û dûrtir bikin.

Dema ku Împaratoriya Osmanî di sedsala nozdehan de lawaz bû, zordestî dîsa bi fetwayên olî yên ku ji hêla sultanatiyê ve derketin û kuştina elewiyan rewa kir, bi taybetî li Heleb û Anatolyayê. Ji ber van fetweyan elewî rastî pêleke nû ya tundiyê, koçberiyê hatin û di encamê de hejmareke mezin a elewiyan ji Heleb, Idlib û Maarat El Numan koçber bûn û gelek ji wan neçar man ku xwe li çiyayan bigirin an jî koçî Lubnan û Anatolyayê bikin.

Tevî ku Osmanî di çewisandina elewiyan de yên herî hovane bûn jî, lê Memlûkiyan ji wan bêhtir kiryarên çewisandinê kirin, wan bacên giran danîn û hemleyên kuştinê li dijî wan pêk anîn, bi taybetî li Heleb û Trablusê, lewma ew neçar kirin ku birevin herêmên çiyayî û bêtir ji civakê dûr bikevin.

Ev kiryar û sûcên berdewam, bûne sedem ku di nava elewiyan de zîhniyeteke giştî derkeve pêş, ew jî zihniyeta tirsa ji çewisandinê û xweveşartinê ye. Lewma wan xwe sparte çiyayan wekî herêmên ewle û ji tirsa dubarekirina qirkirinan bawerî ayînên xwe yên olî veşartî hiştin.

**Komkujiya El-Tilel**

Komkujiya gir yek ji qetlîamên navdar ên ku di mezheba misilmanên elewî bi sedsalan bi xemgîniyek mezin tê vegot. Taxa gir li nêzî Keleha Helebê ye, 2 km li rojava ye. Piştî şerê Merc Dabiq di sala 1516’an de, Siltan Selîmê yekê kînên xwe hilgirt û li dijî elewiyên li Helebê komkujî pêk anîn. tê gotin ku ev komkujiyeke hovane bû ku li navenda bajêr ji cenazeyên şehîdan ji jin, mêr û zarokan gir hatin çêkirin.

**Elewî bi Rêjîma Esed û HTŞ’ê re**

Di dehsalên borî de, Beşar de, elewî wek stûneke bingehîn a desthilatdariyê dihatin hesibandin, û di cihên sereke de di sektora giştî û saziyên leşkerî û ewlehiyê de hebûn, ku hertim girtin, îşkencekirin û tirsandin wek rêgez ji bo tepeserkirina her opozisyonê qebûl dikirin.

Di 8’ê Kanûna 2024’an de rejîma Beşar Esed bi destê Heyet Tehrîr El Şam (HTŞ) û bi piştgirî û plangeriya herêmî û navneteweyî hilweşî. Piştê hatine HTŞ’ê bi rêveberiya Ehmed El Colanî li ser serweriyê. Sûriye bi giştî kete qonaxeke nû.

Li beravîn Sûriyê di Adara 2025’an de çawa ku gelê Elewî bi hinceta bermahiyên rêjîma berê be hatin kuştin û komkujiyên ku tu carî ji bîrwriya dîrokê û ya mirovahiyê nayê windakirin, pêk anîn.

Li gorî rapora Çavdêrîya Sûrî a Mafê Mirovan: Belgekirina 25 qetlîamên li peravên Sûrîyê pêk hatine. Çavkaniyê eşkere kir ku 25 komkujî li beravên Sûriyê hatine tomarkirin, ji bilî 811 vîdyo û got: Navê 2 hezar û 246 qurbaniyan ku piraniya wan ciwan in, li beravên Sûriyê hatine piştrastkirin. Ev komkujî ne tenê ciwan û mêr tê de bûn qurbanî, di heman demê de jin, zarok û kesên temen mezin jî jê bêpar neman.



# ‘MED TV kaniya rastiyê bû’

Yek ji damezrêner û xebatkarên kanala yekem ya Kurdî MED TV Bedran Dere da xuyakirin ku avakirina MED TV bingeha dengê şoreşê bû û wiha got: “MED TV hewil da hemû erk û berpirsyarên xwe bicîh bîn e.”

**Argêş Vîyan/ Qamişlo**

Med TV di 30’ê Adara 1995’an de li Londonê hat damezrandin û ew yekemîn kanala televizyonê ya kurdî ye ku bi rêya satelîtê ji Ewropayê weşanê dikir. MED TV şopandina riya Mazlûm Dogan, Gurbetelî Ersoz û Xelîl Uysalan bû.

Bi boneya salvegera damezirandina MED TV ku yekem televizyona Kurdî bû, yek ji damzerinerê MED TV û pêşkeşvanê Stêrk TV Bedran Dere ji rojnameya mere axivî.

**Damezirandina qenela Kurdî ya destpêkê MED Tv**

Bedran Dere dîroka avakirina yekem kenala kurdî wiha anî li ser ziman: “MED TV di dîroka Kurd û Kurdistanê de xwedî cihekî pir taybet e. Ew piralî û pir girîng e. Wê demê avabna kanala Tv feraseta dewletbûn û desthilatdariya dewletê bû. Fikir ew bû ku tenê dewlet dikarin saziyên wiha vekin û bixebitînin. An jî karsazên milyarder dikarin wiya bikin. Di wê demê de, kanalên TV yên taybet nû dest bi vebûna xwe dikirin. Li Tirkiyê kanalên taybet di 1993’an de vebûn. Me di sala 1995’an de vekir. Di dîrokê de cara yekem Kurdistan û zimanê kurdî bi rêya fezayê gihîşt bi milyonan. Di dîrokê de yekem car gele ku bê dewlet û satû bû xwedî TV. Ev wêne bi serê xwe hêviyek mezin dida mirovan. Ev jî ji aliyê çandî, wêjeyî ve û ji aliyê din ve ji ber ku kurd zêde ne xwenda ne, ji edebiyata devkî hez dikin û ji ber vê yekê kesên ku bi giranî di bin bandora televîzyonê de mane dîsa kurd in. Hebûna Med TV di vê wateyê de bandorek mezin kir. Kesên ku rojname û kovaran naxwînin rasterast TV temaşe dikin. Siyaseta weşanê ya MED Tv li gorî pêşketinên Kurdistanê û herêmê yê wê demê hate plansazî kirin. Taybetmendiyekî MED Tv yê wê demê ev bû ku li ser şopa Gurtbetelî Ersoz û Mazlum Doxanan weşanedeke azad bi hişmendiyekî azad dihat kirin.”

**‘MED TV li ser bingeha feraseta azad weşan dikir’**

Bedran Dere wiha berdewam kir: “Beriya her tiştî derfeta çêbû ku armanc û doza kurdan rasterast bigihîne gele herêmê . Bifikirin ku wan deman gerilla bi şev û roj dimeşin da ku ji gundiyan re çend gotinên li ser dozê bibêjin, hewl bidin xwe bigihînin gund û xelkê ronî bikin. Hewl dida kesekî razî bike. Edî me bi riya Tv xwe digihand herkesî bi televizyonê nûçe, wêje, zanist û siyasetê xwe digihand her kurdî. Ger em MED TV bi yek hevokekê vebêjin, ez ê bibêjim şoreşa ragihandinê ya Kurdistanê bû. Avabûna Kurdistaneke fezayî bû. Şoreşa ragıhandıne ye. Çand, huner û zanist di nav vê de çêbûn. Bû wek okyanûsê, MED TV bû zanîngeh. Li kuderê cîhanê pisporekî kurd hebû, ji vir hat. Kîjan hunermend, şêx, mella, meşaîq û hoca nehatine? Bi hemû endam û karkerên xwe MED TV bû denge rastiyê û rê neda derew û xapandinên wê li ser Kurdan tê kirin. Di heman piştî MED TV jî gelek sazî û dezgehê ragihandin û çapemeniya azad meşiya ev bûn berdewamiya MED TV.”

**‘Ez pir keyfxweşim ku xebatkarêkî MED TV bûm’**

Dere anî li ser ziman ku dê şopandina rêya dengê MED TV bikin û wiha axaftina xwe qedand: “Gelek kesên navdar yên ku doza Kurdistanê xwera bingeh girtibûn bi tevlîbûna xwe MED Tv dan naskirin, veguherînek hebû. Ji komunîstan



bigire heta kesên oldar, ji ateîstan bigire heta bawermendan ji hemû bawerîyan mirov dihatin. Şoreşek bû, ti Kurdek nikare bêje: Di MED TV de firsenda min nebû ku xwe pênase bikim. Bifikirin, partîyek nexwesta were MED TV jî, kursiya wan dihat amadekirin vala dima bi kêmanî mafê beşdarbûna wan ya telefonê hebû. Em kanaleke televîzyonê bûn ku pir bi xwe bawer dikir. Rêvebir û derhêner tedbîrên mezin girtin ku prensîbên TV-yê di karê xwe de bicîh bînin. MED Tv bibû kaniya şoreşa Kurdistanê û diherîkî. Ez jî pir keyfxweşim ku weke xebatkarekê min avakirina dengê rastiyê de cihgirt. MED Tv cudahî nedixwiste di nava gel û civakê, bibû dengê herkesê. Em jî dîsa bi boneya damezirandina MED Tv pîroz dikin û em dibêjin em ê dengê rastiyê bilindtir, xurttir bikin.”

# ‘Şandina alîkariyan erkekî mirovî ye’

**Diyala Nîdal\ Qamişlo**

**Rêvebera Ofîsa jin a Heyva Sor a Kurd Şêrîn Xelîl diyar kir ku Heyva Sor a Kurd pêşkêşkirina alîkariyên mirovî ji bo gelên Sûriyê ên ku zirar dîtine, weke erkekî girtiye li ser milê xwe û wiha got: “Em bang tevahî sazî û komleyên mirovî dikin ku bi gelê beravê re bibe alîkar.”**

Piştî komkujiyên ku li berava Sûriyê pêk hatin, ji bo pêşkeşkirina alîkariyên mirovî, di 17`ê Adarê de bi navê Insiyatîfa Gel a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi hemehengiya Heyva Sor a Kurd dest bi kampaniyeke hat kirin.

Derbarê alîkariyên mirovî yên ku ji bo deverên beravên Sûriyê hatine şandin, Rêvebera Ofîsa jin a Heyva Sor a Kurd Şêrîn Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

Şêrîn Xelîl anî ziman ku bi navê Insiyatîfa Gel a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemehengiya Heyva Sor a Kurd kampaniyeke alîkariyên mirovî ji bo deverên beravên Sûriyê hatin destpêkirin û wiha got: “Di 17`ê Adarê de karwanên me ji bo deverên beravên Sûriyê birêketin, herwiha bi armanca destketdayîna û alîkariya civa-



ka elewî, 16 barhilgirên alîkariyên mirovî ku ji 6 hezar û 350 pakêtin xwarinê û 355 ton ji ard pêk dihatin. Karwanê alîkariyan ji bajarê Qamişlo bi rêketin û ber bi beravên Sûriyê ve çû, di şeva sêşemê de gihişte bajarê Ceble yê beravê. Piştî wê alîkarî di depoyên komeleya Yek Dest de hat bicihkirin da ku li malbatên hewcedar bên belavbikin. Di rê de karwanên me gelek zehmetî kişandin, ji ber hikumeta Şamê a nû merc kir ku logoya Heyva Sor a Kurd a ku li ser balhilgiran bû, bê rahiştin.”

**‘Bi aweyekî rast alîkarî hate belavkirin’**

Şêrîn Xelîl da zanîn ku tevî hemû zehmetiyên li herêmê Heyva Sor a Kurd û saziyên civakî yên sivîl destek da civaka Elewî û wiha berdewam kir: “Weke Heyva Sor a Kurd, saziyên sivîl û civakî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pêşkêşkirina alîkariyên mirovî ji bo gelên Sûriyê zirar dîtine, erkê berpirsyartiyê digire li ser milê xwe, ev yek jî ruxmî astengiyên derdikevine pêşberî me. Hêjayî gotinê ye ku berî niha Heyva Sor a Kurd destek daye mexdûrên erdhejê yên Şehba û Helebê, wê demê de me kon, derman û hemû alîkariyên pêwîst dan welatiyan. Pêşkêşkirina alîkariyan ji bo berava Sûriyê gavake erînî ye ji bo xurtkirina asta têkiliyan di navbera gelan de ên ku zererê dibînin. Di çarçoveya kampaniya Heyva Sor a Kurd de barê karwana alîkariyê li depoya Ras Eleyn a Ceblê hate valekirin, ev yek jî bi hevkariya meclisên Elewiyan û êlên din li herêmên da ku bi rengekî durist li hemû malbatên ku zirar dîtî hatin belavkirin.”

**‘Gelên berava Sûriyê rastî astengiyên jiyanî tên’**

Şêrîn Xelîl eşker kir ku gelên li berava Sûriyê jiyan dikin rastî asteniyên jiyanî tên û hate niha jî ev astengî berdewamin û wiha pê de çû: “Rewşa gelên ku li berava Sûriyê jiyan dikin pir zehmete, herwiha gelê ku li berava Sûriyê jiyan dikin rastî astengiyên jiyanî tên, ew jî encama ku ew ji karê xwe yên di dezgehên hikumetê de hatine rawestandin, ji ber ku piraniya kesan xwe li ser deravên mehane yê ku ji karê xwe werdigirin jiyan dikirin. Ev jî astengiyeke din di dema balavkirina alîkariyan de li pêşberî me derxist, di heman demê de gelek ji kesên li wir cûrbeneqil bi wan re nehatin peydakirin ku alîkariyên xwe bibin gund û cihê xwe, ev jî hişt ku alîkarî dereng bighêje wan. Tevî ku hin komeleyên xwecihî li wir hebûn û bi hemû hewldanên xwe di belakirina alîkariyan de dikirin, lê derfetên di destê wan de ji bo pêdiviyên wan ne têrker bû. Ji bo alîkariyên ku di dema xwe de nehatin belavkirin jî têkilî û hemahengî bi şêx û hin aliyên peywendîdar li Benyasê re hate kirin ku me ji wan re bîlançûyên rast ên malbatên ku zirar dîtine xwest. Kar û xebat bi wan re jî heya niha berdewam e, da ku em ji gihiştina alîkariyan ji malbatan re piştrastkirî bin.”

Rêvebera Ofîsa jin a Heyva Sor a Kurd Şêrîn Xelîl axafitina xwe wiha bi dawî kir: “Em bang li hemû sazî û komeleyên xwecihî û ne xwecihî dikin ku bi gelên beravê re bibin alîkar û piştgiriyekê ji bo wan kesên ku zirar dîtine bikin.”

**FENER**



## Divê Şam xwe ji aqûbeta Baas biparêze

**Idrîs Henan**

Rejîma Baas a berî çend mehan desthilata li Sûriyê bû, bi şaşnihêrandin û şaşxwendina xwe ji tabloya siyasî re ku doza welatekî pireng û pirçand, bi nêzîkatiyên amator û paşverû, kire oxirê berjewendiya mayîndekirina desthilatdariyê û li şûna civakê, berê xwe da hinek hevalbendên berjewendîperest ên weke Îran û Rûsyayê ku li dijî gelên Sûriyeyê bi salan şer, qirkirin û komkujî pêk anî. Lew re, çendîn dereng bû, çendîn divanka wê jî bi êş bû, lê di dawiya dawî de rastî bi ser dikeve û rejîma faşîst a diktator têk diçe.

Hegemoniya navneteweyî ku mudexeleyî aloziya Sûriyê kiribû û yek ji sedemên bingehîn ên kûrkirina kaosa li herêm û Sûriyê bû, derhal destwerdana rewşa piştî Esad dike û li şûna wî, rejîmeke çêkerê Alqayîde bi cih dike. Çendîn serkirde û rêveberên vê rejîmê mask li xwe bar kiribin, lê mesele ji şîrî heta bi pîrî ye. Yanê çiqas cil û berg werin guhertin, çiqas rih bên kurtkirin û ziman werin badan, ti carî rastî û cewherê wan nayê guhertin û ne jî dîroka ku şahidiya kiryarên wan dike tê malaştin. Bê guman, komkujiyên bê serûber ên li Beravê rû dane, mînakên ku qet nayên vegotin. lew re jî, carek din îradeya gelan a ku li ber zihniyeta rejîma Baas a dewlet netew li ber xwe daye û ew têk biriye, wê li ber vê zihniyeta hatiye ferzkirin jî li ber xwe bide û têk bibe.

Hegemoniya navendî xwestiye vê rejîma radîkal li şûna vîna gelan bi cih bike ku îradeya li welêt di bin lepên xwe de bihêle. Ji ber vê jî, gelek welatên YE û yên derdor, her kes li gorî berjewendiya xwe, berê xwe dan qesra Alqayîde li Şamê û bi erkdar û serkirdeyên wê re hevdîtin kirin. Serçeteyên ku li ser lîsteya wan a terorê ne, bûn fermandarên paye bilind û bi buhtanî stêrk û nîşan bi xwe ve daleqandin.

Li rexê dîtir ê tabloyê, sponserê Alqayîde, DAIŞ, Îxwan Almislimîn û hemû tevgerên radîkal ên li dunyayê, bapîr û bavê mezin, dewleta faşîst a Tirkiyê heye. Ji bona piştgirî, geşkirin û rewakirina xet û paradîgmaya olperest ku desthilatdariya xwe tekûztir bike, bi hezaran çeteyên Tirkistan, Ozbek, Şîşan, Tajîk, Dagistan, Elban, Tirk û Ereb derbasî xaka Sûriyê kirin û li bi hev re, tevî komên Wezareta Berevaniyê ya qesra Alqayîde, li Beravê komkujî pêk anîn û şêniyên Elewî bi malbatî qir kirin.

Di bingeh de xwestibûn vê yekê, weke elimandin, li serê Kurdan li Şehbayê pêk bînin. Lê birêxistinbûna Kurdan ku xwedî sazî û dezgehên parastina cewherî ne, rê li ber wê projeya genî girt. Lê ji bona ku wehşiyeta xwe pêşkêş bikin, Berav bê çek kirin, bi şûr û kêrên xwe zarok, jin, kal û pîr serjê kirin.

Çendîn aliyên navneteweyî ku rêya Alqayîde ya ber bi qesrên Şamê ve vekiribin, hişyarî dabin jî ku çi pêkhateyên li Sûriyê cihê xwe di nava rêveberiya welat a nû de bigirin, lê desthilatdariya li Şamê hemû hişyarî û bang paşguh kirin û xwestin bi hinek taktîkên rizyayî gelên Sûriyê bê parastin bihêlin û berê xwe dan Bakur û Rojhilatî Sûriyê û Başûrê welêt ku Kurdan û Dirziyan jî bê çek bikin. Lê rêveberiya bi ezmûn ku xwedî paradîgmaya azadî û demokrasiyê ye, bi polîtîkayên xwe yên profesyonal rê li ber wan azweriyan girt û rijandina xwînê li Sûriyê rawestand.

Ji bona wê jî, eger niyet avakirina Sûriyeyeke pireng, demokrat, nenavendî ku rêzê ji hemû pêkhatiyên xwe yên etnîkî û çandî re bigire, divê kesên li qesra Şamê dev ji rêya ezbeniya ji Tirkiyê re berdin û paradîgmaya demokrasî, edalet, wekhevî û pirengiyê qebûl bikin û mil bi mil bi gelên Sûriyê re, welat ava bikin. Kêmasiyên Baas tekrar nekin ku aqûbeta wê jî ne li we be.